

Nûçe û Çalakî

Heval Mihemedê Mihemed(Bavê Piling) Çû ber dilovaniya Xwedê

Berbanga roja Pêncşembê 14.06.2012an, li bajarê Qamişlo, bi temenê 82 salî heval Mihemedê Mihemed(Bavê Piling) çû ber dilovaniya Xwedê. Bi beşdariya gelek heval, dost û merivan li goristana taxa Hilêliyê hate veşartin û bi navê rêxistina Cizîrê ya Partiya Yekîtiya Demokrat a Kurd li Sûriyê (P.Y.D.K.S) bi zimanê Kurdî derbarê kar û xebata gorbuhuşt ji beşdarên re hate pêşkêşkirin.

Hevalê Mihemed ji sala 1975an ve tevî xebata rêxistinî bûye, bi armanca pêkanîna azadî, aştî û wekhevîyê û misogerkirina mafên



xebateke îjdil kiriye û ta roja dawîya temenê xwe di nava rêzên partiya me de weke heval xebata kurdewariyê berdewam kiriye.

Bila cihê wî buhişt be, sere malbat, dost, heval û hogirên wî sax be!

Birêz Abdurrehman Alûcî

Sekreterê Partiya Demokratiya Kurdî –Sûriyê
Endamê Sekretariya Giştî ya Encûmena
Niştimaniya Kurdî li Sûriyê

Xatirên dawî xwestin

Li Paytexta Kurdistana Îraqê, bajarê Hewlêrê, roja Pêncşembê 24.05.2012, birêz Abdurrehman Alûcî piştî nexweşîyeke giran çû ber dilovaniya Xwedê. Roja Înê 25.05.2012 bi beşdariya hezaran kes, ji welatparêzên Kurd, rêxistin û partiyên tevgera Kurdî û ya niştimanî Sûrî li bajarê Hesîça bi dilên kul, hisret û xemgîniyeke giran hate veşartin.

Mamoste Abdurrehman sala 1950 li bajarokê Amûdê ji dayik bûye. Xwendina seretayî û ya navîn lê bi dûmahî dike paşê diçe bajarê Hesîçe, li wir xwendina xwe ya

Nûçe û Çalakî

Bekelorya diqedîne û sala 1972an Diploma di ziman û wêjeya Erebi de ji zanîngeha Şamê werdigire û dibe mamostayê zimanê Erebi.



Ji sala 1967an ve, dibe endamê Partî, sala 2007an, dibe Sekreter, sala 2011an, careke din weke Sekreterê Partiyê tê hilbijartin.

Ji karê xwe pir hez dike, şagirtên xwe yên Kurd bi derd, êş û bindestiya gelê wan hest dike û li devera xwe ji wan re dibe mînak û nimûne. Şagirtên wî jê hez dikin û gelek ji wan bi tevgera Kurdî ve têkildar dibin.

Gelek gotin, birûsk û name di bin kon de hatin xwendin, yek ji wan, behînameya weşana NEWROZê bû, li jêr em deqa wê diweşînin:

Behîname

**Serokatiya Parta Demokrat a Kurd-Sûriya
Malbata xebatkar ê hêja Abdurrehman Alûcî
Encumena Niştimanî ya Kurd Li Sûriyê**

Bi dilekî tev kul û xem, me nûçeya reş a koçkirina têkoşerê Kurd ê navdar Abdurrehman Alûcî bihîst.

Bê goman e ku koçkirina rêzanekî dilsoz û welatparêz mîna mamoste Alûcî di vê qonaxa hestiyar de, ji doza gelê me yê Kurd û xelkê Sûriyê bi tevayî re têkçûn û ziyaneke mezin e. Lê belê di heman demê de bawerîya me ew e ku wekî her car, dê gelê me bi lez birînên dilê xwe derman bike û xebata xwe ya aştîyane ji bo bidestxistina mafên xwe yên dadmemd û rewşa berdewam bike.

Di vê şîn û behiyê de, di komîta weşana NEWROZê de em xwe hevparê derd û xemên we dibînin.

Bila serê gelê Kurd û xebatkarên wî yên dilsoz sax be!

Serê malbat, heval, dost û hogirên wî sax be û cihê wî buhişt rengîn be!

25.05.2012Z

Komîta weşana NEWROZ